# EKOLOJÎ



# EKOLOJÎ

**WEŞANÊN KOMÎTEYA LÊKOLÎN Û ZANISTÊN CIVAKÎ**

EKOLOJÎ

WEŞANÊN KOMÎTEYA LÊKOLÎN Û ZANISTÊN CIVAKÎ

ÇAP: 2018

Akademiyên Civaka Demokratîk
أكاديميات المجتمع الديمقراطي

**www.cıvakademokratık.com/kurd/**

**civaka.dimokrat@gmail.com**

# NAVEROK


**Pêşgotin:……………………………………………………3**

**BEŞA YEKEMÎN:**

**A) Ekolojî çiye.......................................................6**

**B) Sedema derketina zanista ekolojî………..……7**

**C) Di derbarê ekolojî de nêrînên fîlozof û zanyaran……………………………………………8**

**1-Thales: (624-548 B.Z)……………………………9**

**2-Zerdeşt (BZ 1000-600)…………………..…..10**

**3-Heraklîtos:( 535.475 B.Z ) …..………………11**

**4-Tevgera kesk……………………………………13**

**5-Tevgera ekofemînîzm…………………………..14**

**6-Tevgera ekolojiya kûr…………………………..14**

**BEŞA DÛYEMÎN:**

**A) Ekolojiya Civakî……………………………....19**

**B) Li gor Rêber Abdûllah Ocalan Ekolojî……....21**

C) Têkiliya di navbera mirov û ekolojiyê de çiye?...........................................................23

D) Di civaka xwezayî de Ekolojî……………..…..26

Ç) Zanista pozîtîf, çawa nêzî xwezayê dibe?........29

E) Nêzîkatiyên Di Derbarê Ekolojî de……..…....31

F) Pirsgirêk û xeteriyên li ser ekolojî………….....38

BEŞA SÊYEMÎN:

A) Rengên lewitandina xwezayê……..………..41

B) Şoreşa pîşesazîtî…………………………… .43

C) Têkiliya aborî û ekolojî………………………44

D) Têkiliya aborî û ekolojî…………..…………49

BEŞA ÇAREMÎN:

A) ENCAM…………………………..………..…..54

B) Terikandina tekiliyên tehakkûmê……..…….55

C) Hemwelatiya azad û hêsten welatparêzî…….56

D) Hejmara bêsînor ya bajêra………………….58

E) Cîvaka demokratîk û ekolojîk……………....59

## Pêşgotin:

**Adorno : jiyana şaş rast nayê jiyîn .**

Di gotina Adorno de mirov dighêje rastiya dîrokê ya ku bi hezarî salan di bin zordariyê de hatiye veşartin û rastiya xwezayê dijber kiriye. Heger mirov li jiyana rast vegere yan civaka xwezayî dibîne ku ekolojî çawa bi rêveberiya jin dayîka –xwedawend bûye bingeka jiyanê. Xweza wek hebûna xwe didîtin û ku pareçeyek ji giyana wan e.

Lê bi derketina hizrê desthilatdariyê re ew jiyan dijber kirin û gotin ev jiyana rast e . Ji bo xurtkirina xwe di şexsê jina xwedawend de Ekolojî kirin xizmetkarên hişmendiya xwe û pilanên xwe di riya xwezayê re bikar anîn û civak û xweza ji hev didine qutkirin.Nêzikatiyên civakê ji xwezayê re li ser esasê serwerî dan çêkirin, bi riya ekonomî, pêşesazî û ..hwd .

Di nava vê aloziyê yan pirsgirêkan de gelek fîlozof û zanyar ji bo çareserkirina vê xetimandinên derketin holê, her yekî xweza bi rengekî cuda şirovekirin, her wiha gelek tevger jî ji bona vê rabûn, lê belê bi felsefeya Serok Abdulah Ocelan re ji nû ve ekolojiya

rast da nasîn û weke çareserî ji civakê re da xuyakirin û got : Heger zihniyeta hukimdariyê neyê qeliskirin û rakirin, li dewsa wê jî fikreya azadî û demokratîk neyê jiyîn, wê pirsgirêkên Ekolojî yan xwezayê çareser nebin, ji ber bingeha hemû pirsgirêkan zihniyet e .

Ji bo vê jî me di destpêkê de anî ziman ku jiyana şaş rast nayê jiyîn û ta ku em di pirsgirêkên xwezayê de jiyan bikin, wê her tim jiyana me şaş werê jiyankirin.

# BEŞA YEKEMÎN

## A) Ekolojî çiye

Zanisteke ku têkiliyên di navbera xwezayê û civakê lêkolîn dike, hemû pirsgirêkin ku xwezayê de heye çareser dike. Ekolojî ne tenê xwezaye, her tiştî di hindirî xwe de dihewîne. Mirov, nebat, dar, lawir û li ser navê zindîbûnê çi hebe. Her tişt dixwezayê de hatiye afirandin û zindiye. Ji ber ku xweza bixwe zindî ye. Xweza dayîka afirînêr ya hemû zindiyan e. Ekolojî ne tenê zanistek e. Di heman demê de parastina hawirdor e.

Ekolojî nayê sînor kirin; Zanisteke berfireh e ango bi xwezayê re hevaltî çê dike.

Li aliyê din hewl dide ku biyanîbûna di navbera pergala cîvakê û xwezayê de çêbûye û qutbûna heyî sererast bike. Ekolojî di esas de li dijî fikrê siltê ye.

## B) Sedema derketina zanista ekolojî:

Di destpêka sedsala 18 'an de pirsgirêkên ekolojî û hêzên mêtinger zêdetir dibin, di wê demê de dest bi xerabûn û rakirina daristana kirin. Her wiha bi destpêkirina şoreşa ronensansê, şoreşa sanayiyê û bi pêşketinên teknolojîk re demeke nû dest pê dike, lê belê bandora mirovahî li ser xwezayê zêdetir dibe, ji bo vê yekê jî zanyar û fîlozofan pêwistî bi zanisteke ku xweza û hawirdorê bixwîne û biparêze dîtin. Di wê demê de têgeh an jî zanista xwezayê derxistin holê, ya ku nave Ekolojî lê tê kirin.

Têgîna ekolojî wek cara yekem di sedsala 18 an de ji aliyê fîlozofekî sosyoloji(civaknasî) Ernest Heykil ve hatiye bi kar anîn. Wekî peyv ji “okos”; tê wateya navmalî yan jî xwezayî, cihê ku zindî lê jiyan dikin. “Logos” jî tê wateya zanist, zanyarî, îlim. Bi vî awayî ekolojî lêkolîna navmalî çêdike. Piştre ji aliyê fîlozofê bi navê Mûrray Boockhîn (Mûray Bûkîn) ve hatê dest girtin. Weke têgîneke zanistî di sala 1874 de wek pirtîk bikar tînin. Di zimanê kurd de jî ji ekolojiyê re digotin hev re zanistî Ev peyva kêm caran bi ramanê derdora xwebiparize dihate bikaranîn, peyva

hev re zanistî wekî tayekî jinwerzanistî dihat hesibandin. Ekolojî yan jî hev re zanistî, bi îngilîzî jî dibêjin (ecology).

**D) Di derbarê ekolojî de nêrînên fîlozof û zanyaran**

Berî ku felsefeya xwezayê pêş bikeve mirovan xwezayê bi rêka çavdêrî, animîzm, mîtolojî û ceribandinên mirovahî dixwestin nas bikin. Belê ev rêbaz tenê ji bo nas kirina xwezayê bû. Di derbarê pêş xistina xwezayê de hin zêdetir pêwistî bi felsefeyekê hebû.

Fîlozofan guhertinên di nav xwezayê de pêk dihat pir meraq dikir. Tiştên ku di nav xwezayê de diqewimin bê ku serî li çîroka bidin, dixwestin fêm bikin. Bişêweyekî xwezayî çavdêriya xwezayê nasbikin.

Mînak: Ji birûskan bigire heya baran, çêbûna her çar demsalan bê ku wan bispêre dinyaya xweda, hîn zêdetir ji çavdêriya xwezayê bi xwe lêkolîn dikirin. Em dikarin bêjin ku di aliyên hizirîna zanistî de gava yekem avêtin. Ji van fîlozofan gelek fîlozofên ku bi taybet li ser ekoloji yan jî xwezayê lêkolîn kirine hene. Weke;

Tales, Heraklîtos, Zerdeşt, Manî, Rêber Abdullah Ocelan… Niha em yek bi yek fikir û nêrînên van fîlozofan bidin nîşan dan.

**1-Thales: (624-548 B.Z)**

Fîlozofê yekem yê li ser xwezayê lêkolîn kiriye û nêrînê xwe daye Thales e. Cara yekemîn bi ceribandin û çavdêriyê xwezayê nirxandiye û zanîn pêş xistiye. Gîringiya "Thales " di vir de ye; bê ku xweda tevlî kar bike, xweza li ser tekiliya cewherî xwestiye bide xuyakirin.

Thales li derdorê xwe dinere av heye. Li laşê mirova, gewdê lawira û nebata dinêre beşek zêde jê av e. Wê demê dibêje cevhera seretayî av e. Dibêje gerdûn ji avê hatiye afirandin. Her tişt ji avê bûye û wê dîsa her tişt bibe av.

## 2-Zerdeşt (BZ 1000-600)

Di navbera salên 1000-600 B.Z de jiyan kiriye. Li gor lêkolîna, Zerdeşt li Rojhilatê Kurdistanê li bajarê Urmiyê jiyan kiriye. Fîlozof, bawermend û lêgerînvanê mezin yên Kurda ye. Her çiqas dîroka bi destê serdesta hatiye nivisandin Zerdeşt wekî Fars nîşan dide jî, zimanê pirtûka wî Avesta, çanda wî û şert û mercên cihê lê jiyan kiriye diyar dike ku şexsiyetekî Kurd e. Serdema Zerdeşt jiyan dikir, çandina axê, bi axê re mijulbûn pir lewaz bûye. Cihê li ser şoreşa neolîtîkê pêş ketiye, ji ber nêzîkayiyên serdesta ji axê dûr ketin çêbûye. Baca ku ji gundiya tê girtin, talan û desteser kirina axê dihêle ku gel wekî berê bi axê re mijûl nebe. Bi derketina Zerdeşt re di vê mijarê de pir tişt diguherin. Felsefe û baweriya Zerdeşt weke bingeh ji xwe re vegera çanda neolîtîkê esas digire. Rizgariya exlaq û nirxê civakê di çanda neolîtîkê de dibîne. Li gor Zerdeşt ax pîroz e û dayîka hemû zindiya ye. Di milê aborî de çandinî, cotkarî esas digire. Ji bo Zerdeşt çawa ax pîroze kesê ku axa xwe cot dike û bi axê re mijûl dibe jî di heman demê de bi nirxe. Zerdeşt rojên xwe di nav daristanan de, li ser dar û beran, bi çûk û ajalên din

re derbas dike. Şev jî li ser stêrka lêkolîn dike. Dîsa li ser sirûşt, element, av, agir, hewa, ax û hwd lêkolîn dike. Lawirên ku şîr didin, yên cot dikin, lawirê bar û siwariyê bû nahêle werin serjê kirin. Zerdeşt di wê baweriyê de ye ku çanda qurban kirina lawira jî divê ji holê rabe. Ji bo bûyerek an jî hebûneke xwezayî, qurban kirina zindiyekî rast ne didît. Ji ber vê yekê jî dibêje; divê çanda qurban kirinê bi giştî ji holê rabe.

Zerdeşt cîhanê ji pênc elementa digire dest. Ev element jî av, ax, ba, agir û şînkahî ye. Û ev her pênc element jî pîrozin. Di nav wan de weke ya herî esasî û bingehîn jî axê dibîne. Yanî tê xuyakirin ku zerdeşt xweza wekî bingeha çêbûna mirov û gerdûnê didît.

## 3-Heraklîtos:( 535.475 B.Z )

Heraklîtos li ser xwezayê û heyînê lêkolîn û lêpirsîn kiriye, tê gotin ku agir weke cewherê afirandina gerdûnê dîtiye û dibêje: Agir her dem di nava guherînê de yê.

Agir wekî heybereke bingehîn dibîne, li gorî wî agir rastiye. Gava duyemîn davêje bê ku xwedê tevlî bike

dibêje:  bingeha xwezayê tevgerandina xwe bi xwe ye. Dîsa dibêje: Xweza li ser sîstema zagonan ên hindirîn bi pêş dikeve. Di heman demê de gotineke xwe yê navdar heye dibêje: her tişt di nava guhertinê de ye, tiştê ku nayê guhertin, guhertin bi xwe ye.

Her wiha ji fîlozofan zêdetir û piştî zêdebûna pirsgirêkên ekolojiyê gelek kongre li ser asta cîhanî ji bo parastina ekolojiyê derketin holê yan li dar xistin;

Di qonaxên dîrokê de, piştî derketina hizrê desthilatdariyê ya ku xweza û mirov ji hev cûda kirine û ku gelek zirar gîhaye ekolojî, ji bo vê yekê tevgerên navnetewî gelek kongre li ser ekolojiyê li dar xistin.

Di sala 1949 an de cara yekemîn tevgerên nav netewî bi tevlîbûna nûnerên dewleta ji bo parastina ekolojî li bajarê DYA- Nêw York ê kongreyek li dar xistin. Di kongreyê de nîqaş li ser çavkaniyên sirûştî û wê çawa amûrên ku siruştî bi hêsanî derxin holê çê bikin, her wiha li ser parastina ax, daristan, lawirên şînahî û avî weke masiyan nîqaş hat kirin.
Lê belê ev kongre ji bo xira kirina ekolojî nebû çareserî, û zirar hîna zêdetir bû.

Di heman demê de gelek kesên navdar jî ji bo ekolojiyê nivîsîne, weke (Rachel Carson) ê ku pirtûka (El rebî el samêt~Buhara bêdeng) nivîsiye, di pirtûka xwe de behsa gelek cûreyên çivîkên ku ji ber zêdebûna sirûşteyîn kêmyawî hatine qirkirin dike, her wiha behsa komkujiyên mirov li dijî ekolojiyê bi taybetî di riya dermanê kêmyewî de dike.

Di heman demê de di sala 1972 de disa kongreyeke navnetewî bi taybet li ser persgirêkên ekolojî û parastina hawirdora mirovahî, li (stokolmê) hat çêkirin.

Zêdetirî wan kongreyan gelek tevgerên Ewropî yên bangî parastina ekolojî û lêkolîn li ser dikin derketine holê. Weke tevgerên hawirdorparêz, tevgera kûr, ekofemînîzm hwd.

## 4-Tevgera kesk

Li welatê Elmanya pêş ketiye. Tevgera kesk bê ku xwe ji pergala dagirkerî qut bike, çareseriyê di hinek reforman de dibîne. Sedema xirabûna ekolojî di bingeh de wekî encama pergala desthilatdariya nagire dest, weke encama tiştên ku davêjin xwezayê û bi vê re

qirêjbûna xwezayê dibîne. Ji ber ku di hindirê pergalê de ye seranser e û encam nagire.

## 5-Tevgera ekofemînîzm

Di sala 1970 de tevgera femînîst di derbarê ekolojî de gihişt encamekê. Di derbare ekolojî de sala 1983 pirtûka Carolyn Merchant “Mirina xwezayê, Jin, ekolojî û şoreşa zanistî” bingeha vê tevgerê ava dike. Ev tevger jin û xwezayê yek digire dest. Li gor nêrînê wan çawa ekolojî xera dibe, wisa rewşa jinê jî xera dibe. Feraseta dagirkerî çawa dixwaze xwezayê dagir bike, li ser xwezayê hikma xwe bike; zilam jî wisa dixwaze li ser jinê hikma xwe bike û jinê bike kole. Li gor nêrînê vê tevgerê jin û xweza bi hezar salan tên dagir kirin. Ji ber wê jî dîroka xweza û jinê bi hev re dimeşe.

## 6-Tevgera ekolojiya kûr

Nêrînên ku mirov û xweza ji hev qut dike, qebûl nake. Mirov û xweza bi hev re digire dest. Damezrînerê wê Arne Naess e. Li gor nêrînê wî mirov tenê perçeyek ji xwezayê ye. Divê fikrê ku mirov dixe navenda xwe

were terikandin. Xweza ji xeynî mirova jî hebûne xwe heye. Ekolojîstên kûr hêmanên xwe di heşt xala de kom kirine.

*Li ser rûyê erdê pêşveçûna jiyana mirov û ya zindiyên din xwedî nirxeke hindirîn e. Ne tenê mirov her zindî xwedî vê nirxê ye.

*Dewlemendî û çeşîdbûna şiklên jiyanê ji bo pêk hatina van nirxa têrker dibe. Ev çeşîdbûn û dewlemendî di heman demê de di hindirê xwe de binirxe.

*Ji xeynî pêwistiyên xwe yên jiyanî bicih bînin, tu mafê mirova tune ye ku ev dewlemendî û çeşîdbûnê tune bikin.

*Ji bo jiyana mirov û çanda mirov bidome divê hejmara mirov were kêm kirin. Ji bo jiyana zindiyên derveyî mirov jî bidome, pêwistî bi kêm kirina hejmara mirova heye.

*Di rewşa heyî de mirov li ser zindiyên din zêde bi zêde midaxale dike. Rewş her diçe xirab dibe.

*Lewma divê polîtîka werin guhertin. Polîtîkayên ku werin guhertin wê li ser awahiyên bingehîn yê aborî,

teknolojîk û birdozî bandor bike. Encama vê ji wê ji rewşa heyî cûdatir be.

*Guhertina birdozî wê binirx kirina wesfê jiyanê armanc bike.

*Kesên ku van hêmanan dipejirînin, yek bi yek li hember pêk anîna wê jî berpirsiyarin.

Her çiqas hewildanên ekolojiya kûr hebe jî di mijara çareseriyê û dest girtinê de seranser dimîne. Dîsa bingeha pirsgirêka ji civak û pirsgirêkên civakî qut digire dest.

Mûrray Bookchîn ji bo ekolojiya kûr dibêje; ***“bê şikile, ne diyar e û xwe bi xwe tune dike.”***

Lê belê ev tevger jî nebûn çareserî sedema wê jî, ji ber ku xwe ji zihniyeta dewletê xelas nekirin. Di mijara nêzîkatiya rast ya li hember xwezayê de tevgera herî rojane, rast û bingehîn tevgera azadiya gele Kurd e. Bi fikrê Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocelan bi fikrê civaka ekolojîk ve ekolojî digihije cihê heq dike. Rastî û cewhera ekolojiyê ji nû ve tê jiyîn. Di serî de li dijî

zihniyeta dewletê derdikeve, desthilatdariyê red dike û netewa azad û demokratik esas digire.

Serok Abdûllah Ocelan di bingeha felsefeya netewa demokratîk de xala ekolojî tîne ziman û dibêje**: "*Nasîn û parastina ekolojî, jiyîn û berdewamkirina civaka azad e û di heman demê de ekolojî ne tenê zanista ku dewlet di dibistan û zaningeha de dide, bi xwe vejîna gerdûnê ye.*"**

# BEŞA DÛYEMÎN

## A) Ekolojiya Civakî:

Li gor felsefeya ekolojiya civakî di bingeha hemû pirsgirêkên ekolojiyê de tehakûma li ser xwezayê û pergala hiyerarşîk heye. Bingeha felsefeya ekolojiya civakî Mûray Bookchîn daniye. Li gor Bûkîn, xweza hemû zindiya di nav xwe de dihewîne. Xweza ji merheleyên dîrokê heta niha peresîna xwe didomîne û zindiye. Çawa ku hemû zindî di nav xwezayê de dijîn, perçeyek ji xwezayêne, têkiliya civak û xwezayê jî bi vî rengî ye. Ji bo wê jî divê civak û xweza di nav hev de were dest girtin. Di nav xwezayê de zindiyê peresîna xwe bi awayekî cûda domandiye mirov e. Di serî de hêza fikirandinê xweseriya mirova ye. Lê divê ev cûdabûna peresînî ne be sedem ku mirov li ser xwezayê û li ser zindiyên din tehakûm bike. Di nav xwezayê de mirov weke xwezaya duyemîn tê bi nav kirin. Divê xwezaya duyemîn û xwezaya yekemîn di nav hevsengiyekê de peresîna xwe bidomîne. Dîsa xweza ne weke qadeke mecbûriyê ye. Divê xweza wek qada azadiyê were dest girtin. Ji bo wê jî tevgera mirova li ser esasê pîvanên azadiyê be.  Bûkîn civakbûna

xwezayê di civakên xwezayî yên serdema neolîtîkê de dibîne. Ev fikrê xwe bi vê gotinê tîne ser ziman:

***"Di civaka xwezayî de xweza ne tenê cihê ku lê dijîn e. Di heman demê de bi kehanetê xwe agahiya dide wan, bi kamûflaja xwe ewlehiya wan bidest dixe, bi şaxên xwe yên şikestî, bi şopa linga peyamên veşartî dide. Bi wîzîniya bayê hişyariya dide, bi nebat û lawira diyariyan dide. Di heman demê de xweza jî tevlî jiyana mirovan dibe."***

Li gor Bûkîn; ji bo ku civaka ekolojîk were ava kirin, divê tehakûma mirov ya li ser xwezayê û tehakûma mirov ya li ser mirov ji holê rabe. Hemû tebeqeyên di nav civakê de hatine ava kirin divê hilweşe û civak ne li ser esasê çîna li ser esasê wekheviyê xwe bidomîne. Teknolojî bi şiklekî ku li ser xwezayê zerar çê neke were tanzîm kirin û ji bo enerjiyê xweza neyê qirêj kirin. Hin zêdetir enerjiyên xwecîhî û yên ku karibin xwe nû bikin divê were hilbijartin.

## B) Li gor Rêber Abdûllah Ocalan Ekolojî:

“Desthilatiya li ser xwezayê, jê biyanîbûn, bi dijminahî, bi berjewendî nêzikbûn berhema çanda desthilatiya zilam e. Xweza jî weke jinan ji aliyê heman zîhniyetê ve tê dagirkirin.

Ekolojî civak çawa ji nava xwezayê derketiye û bi pêş ketiye nîşan dide. Di heman demê de pêşketinên civakê jî destnîşan dike. Cardin dixebite ku pergala civakî ya heyî çawa dijberî xwezayê ketiye di bingeh de lêbikole û çavkaniyên pirsgirêkan tespît bike. Di aliyê din de hewl dide ku ji bo biyanîbûna di navbera pergala civakî û xwezayê de çêbûye û qutbûna heyî were sererastkirin çareseriyan hilberîne, pêşxistina hewldanên sererastkirinan hedef dike.

Ekolojî ne tenê zanîneke parastina hawîrdorê ye û tenê bi derdorparêziyê re naye sînorkirin. Ekolojî; zanîneke berfireh a têkiliya xweza û mirov bi hevdu re û bi giştî di nav xwe de radigire. Ya girîng di nav pergala civakî de lêpirsîna pirsgirêkên ekolojîk e. Derdorparêzî di wateyekê de muhendîsiya xwezayê ye. Berhema

nêrîneke bi navend mirov e. Di fikra wan çavkaniyên bi nezanî tên tunekirin ku nifşên nû jê bêpar dimînin de ye. Di wateyekê de di pey pêşketinên teknîkî yên ku encamên nebaş ên sanayîbûnê kêm bikin û ji holê rakin de ye.

Ekolojî di esasê xwe de li dijî nêrîna hiyerarşîk a ku xwezayê şîrove dike derdikeve. Hewil dide ku nêzikatiyên di roja îro de li ser xwezayê xwe hakimkirin, dagirkirin û bênirxiyê ji holê rake. Cardin bi armanca avakirina rêzdariya civakê li hember xwezayê, nêzikatiyên mirov ên ku zindiyan pîroz û zindî dibînin bi komikan re ji nû ve bide pêşxistin. Dixwaze êdî dawî li qirêjkirina xwezayê, hincirandina (xerakirina) wê, rûbirû mayîna wê li bûyerên nebaş bîne. Civaka mirovan ne di jora xwezayê de ye, ne jî di jêra xwezayê de ye. Bi xwezayê re, di nava têkiliyeke beramberî hevdu, dixwaze jiyaneke bi aheng bi dest bigire.”

## C) Têkiliya di navbera mirov û ekolojiyê de çiye?

Civak bi xwe di cewhera xwe de xwedî pêşketineke ekolojik e, ev jî tê wateya ku mirov bi xwezayê re û bi awayekî xwezayî di nava guhertin û veguhertinan de ye. Dikare zinhiyet û nêzîkatiyên xwe li hemberî xwezayê bi awayekî baş bi kar bîne, lê ev yek nekirin ji pêşketin û afrandinê derbasî asta xirabûn û tunebûnê bûn.

Çawa ku mirov ji bo xwe li azadiyê digere û ji bo bedena xwe li şertên guncav digere divê ji bo ekoloji û her zindiyekî di xwezayê de hem fikir be.

Bi taybet piştî ku berhem ji xwezayê tên berhevkirin û komî ser hev dibin, bi wê re kesên ku vî barî radikin êdî hêdî hêdî zihniyeta wan ber bi xirabûn û çavtengiyê ve diçe.

Ne tenê berhemên komkirî, lê sûcekî li dijî zindiyan dikin hetanî ku êdî xwezayê ber bi tunebûnê ve dibin.

Dema ku berhem zêde dibin û zihniyeta desthilatdarî derdikeve pêş bi wê re jî sîstema ekolojiye tê guhertin

û mirov xwezayê li gora xwe û berjewendiyên xwe bi kar tînin.

Yanî wek berê ku bêjin xweza dayîka mirovahiyê ye nema ye, di dema niha de mirovahiyê xweza xistiye bin xizmeta xwe û ji bo xwe bi kar tînin. Hemû teknolojî û tiştên heyî ji xwezayê çêdikin. Ji bo avakirina bajarvaniyê xwezayê tune dikin.

Ji lewre sîstema xwezayê xerab bûye û di dema îro de bandorê li ser tendirustiya mirov û her tiştî dike.

Piştî derketina sîstema deshilatdarî û bi pêşketina teknolojıyê êdî mesafeyek ket navbera mirov û xwezayê. Êdî mirov weke berê parastina xwezayê wek erkekê li ser milê xwe nabînin di heman demê de mirov dikare zihinyeta sîstema desthilatdar ya li hember jin û xwezayê wîne beramberî hev ku yê zêde xweza parastiye û xwedî lê derketiye jin e. Ji ber taybetmendiyê ku di xwezayê de hene di heman demê di jinê de jî hene, yanî hêza afrandinê di herduyan de heye. Her wiha ji ber têkiliya di navbera mirov û xwezayê de û dagirkeriya li ser ekolojiyê cîhana me hatiye rewşekî wisa ku ber bi xeteriya ekolojiyê ve diçe.

Xwezayê tune dikin li şuna wê bajarvaniyê ava dikin. Mirovên ku xwezayê dikin xizmeta berjewendiyên xwe ne tenê ji xwe re bi kar tînin, lê ji nivşên nû re tiştekî nahêlin ev yek jî xeteriyeke li hemberî sîstema çêbûna mirovan.

Jiyana mirov ne li jora xwezayê ye û ne jî li jêra xwezayê ye xweza û mirov di nava ahengekê de ne û di esas de hevdû temam dikin. Lê mirovên ku li ber destên sîstemên kaptalîst mezin bûne keda xwezayê ji bîr kirine ji wê zêdetir mafê xweazayê yê jiyanê û hawirdora wê dagir û binpê kirine.

xwezaya ku dar, nebat, ber, lawir û hwd hemû zindî tê de cih digrin weke xwezaya yekemîn tê dest girtin. Mirov jî weke xwezaya duyemîn ya ku ji xwe xwezayê tê. Mirov jî di nav vê xwezayê de xwezayeke bi taybetmendiyê xwe bi rengê xwe heye. Ji ber her zindî taybetmendiyên xwe hene. Di nav hemû zindiya de zindiyê ku gihiştiya hêza fikir û wate mirov e. Ev jî di nav zindiya de xweseriya mirova ye. Ji ber vê jî em mirov weke xwezaya duyemîn dest digrin. Lê ev fikir û cûdahî ne li ser esasê dagirkerî û siltê ye. Divê armanca vê cûdabûnê mirova ber bi azadiyê ve bibe.

Tehakûma mirov ya li ser xwezayê di heman demê de ji armanca azadiyê dûr ketine. Ji ber ku mirov encax li gor xwezayê tevbigere dikare azad bibe. Azadî di xwezayê de heye. Berovajiyê vê ger mirov xwezayê dagir bike û ji bo berjewendiyên şexsî xwezayê bike koleyê xwe wê demê ji azadiyê jî dûr dikeve û jiyana civakê dixe xeteriyê. Di heman demê de ji ber ku mirov ji zindiyên din cûdatir dikare bifikre û wate bide derdorê xwe, wê demê ev taybetmendî bar li ser pişta mirova dike. Ev jî parastina giştî xwezayê ye. Mirov çawa parastina xwe di nav şertên xwezayê de fêr bû, divê xwezayê jî biparêze. Di nav xwezayê de dibe ku zindiyê herî lewaz mirov e. Lê mirov bi eqlê xwe vê lewaziyê veguherandiye pêşwendiyê. Divê niha jî vê feydeya fikir ji bo parastina xwezayê bikar bîne. Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocelan hemû daristan, şînkayî û lawiran emanetî me dike. Ji ber parastina xwezayê parastina azadiyê û parastina jiyanê ye.

## D) Di civaka xwezayî de Ekolojî:

Di civaka xwezayî ango xwezaya civakê de ekolojiyê li gorî hawirdora xwe şekil girtibû û xweşikbûna xwe

temam dikir, ji ber mirovên xwezayî nikaribûn dest bavêtina xwezayê. Çawa ku her parçeyek ji canê xwe diparastin bi vî awayî her parçeyek xwezayê jî parastine. Ji ber ku zanibûn yê ku wan ji nexweşî û metirsiyên jiyanê xilas dike ew jî xweza ye. Di heman demê de bi vê zihniyete tev digeriyan çawa ku mirov rihê wan heye û jiyan dikin, her tiştek di xwezayê de ew jî bi ruh e. Mirovên xwezayî, xwezayê baş lêkolîn dikirin. Ji bo wan xweza mamosteyê herî mezin bû. Dema ku tiştek ji xwezayê keşif dikirin ji wê dikaribûn her tişt biafirandana. Ji sûda wê zêdetir lêhûrbûna mirov li ser zanistê kûr dikir.

Bi çavê sûd, zanist, fikir, xweşikbûn li xwezayê dinêrîn.

Derbarê ekolojiye de Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dibêje di binghê de xweza hevdu xwedî dikin û temam dikin.

Çawa ku mirov hev du xwedî dikin û temam dikin di heman demê de mezin jî dikin. Xweza jî bi wî awayî tev digere. Lawir, dar û ber, av, hawa, çiya û hwd… maneya her tiştekî ji van sûda her tiştekî ji van dihêle ku yê din jiyan bikin.

Wek mînak şînkayiya li ser axê dihêle ew kêzik û kurmikên biçûk jiyan bikin mirina wan zindiyan dihêle tiştek nû di axê de çêbibe.

Tu tiştek bê sûd û mana di xwezayê de derneketiye, her zindiyek ji yê din sûd werdigre û li gorî tewazin di xwezayê de tiştên pêwîst ji hevdu digrin.

Yanî li gorî ku tê xuyakirin di hundir xwezayê de tu zindiyekî zirar li yê din nedikirin. Li gorî hawirdora xwe jiyan dikir û xwe temam kir. Ji ber ku zihniyeta dewlet ango zihniyeta desthilatdarî tune bû her tiştek li gorî xwezaya xwe dihat jiyan kirin û hevdu temam dikirin.

Mirovên xwezayî xweza ji xwe re wek dayîk didîtin ku xwe di hembêza wê de diparastin di heman demê de xweza jî ji xwe re wek zarok jî didîtin û xwedî dikirin.

Yanî ku gulek ba, av didan, ku lawireke xwedî dikirin, ku çiyayeke nirxên wê diparastin û hwd…

Di hin qebîle û klanan de mirov nav û teybetmediyên lawira li xwe dikirin. Bi vê yekê re di hindirê xwe de rihê wê zindiyê hîs dikirin. Bi taybet di nav çermsora de navê hin teyr û gura li xwe kirin berdewamiya vê

çandê ye. Di klanên nêçîrvan de jî mirova ji bo xwe têr bikin nêçîr dikirin. Ne ji bo tune kirina cinsê lawira. Di nav lawira de yê herî lewaz nêçîr dikirin ku lawirên xurt bikaribin berdewamiya cinsê xwe bikin. Bi wî avayî tu cinsê lawirekî tune nedibû. Nêçîra lawira ne ji bo tune kirinê ji bo xwe têr kirinê bû. Demaa lawirekî nêçîr dikirin û dixwarin wisa bawer dikirin ku rihê wî lawirê wê di hindirê wan de jiyan bike. Di heman demê de ji ber ku wan têr kiriye ji wê lawirê re dia dikirin. Dîsa mirovên neolîtîke xwe bi xwezayê re yek didîtin. Bi daristana re, baranê re, brûska re diaxivîn. Pîrozbahî ji mile xwezayê ve didîtin. Bawer dikirin ku rihê xwezayê wan diparêzê. Mikabilê vê jî mirovên xwezayî jî zindiyên din li hember dagirkeran diparastin. Di heman demê de xweza jî wan diparast û bereketa xwe li ser wan kêm ne dikir.

## Ç) Zanista pozîtîf, çawa nêzî xwezayê dibe?

Li beşa jorê de li ser dest girtina ekolojî ya civaka xwezayî sekinîn. Destgirtin û nêzîkayiya civakê heya demeke dirêj bi vî rengî bû. Di heman demê de dest girtina zanistê jî ewqas ne xirab bû. Ji ber ku kesên

zanyar jî ji nav wê civakê derdiket û bi nirxê civakê mezin dibû. Zanista wê demê jî hin bi giştî ne xirab bû. Heta sedsala 16. Jî zanyar li dijî tahakkum û kontrol kirina xwezayê bûn. Hin zêdetir fêm kirin û şîrove kirina xwezayê û bi xwezayê re di nav hevsengiyê de jiyan kirin esas digirtin. Xwezayê wek zindî wek manevî didîtin. Piştî Newton û F. Bacon di zanistê de jî li hember xwezayê guhertin çêbû. F. Bacon û Newton xwezayê ji bo mirova weke xizmetkarekî dibînin. Li gor fikir û nazariya wan divê xweza di bin xizmeta mirova de be. Zanista li ser vî fikrî pêş ket êdî xwezayê ne weke zindî weke tiştekî ne zindî dibîne. Di encama vî fikrî de li ser xwezayê her ceribandinî heq dibîne. Di encama vê de zanist û teknolojiya heyî dijekolojî ye. Li gor Bacon; "divê xweza bi zorê were desteser kirin. Ji bo xizmetê were mecbûr kirin. Divê xweza were kole kirin." (Capra 1992 sf 56).

Li vir Bacon xwezayê wek jin dibîne û li hember xwezayê her cûreyê dest dirêjiyê ji bo xwe maf dibîne. Ji bo jê feyde bigire kedî kirin û kole kirina xwezayê şert datîne.

Zanista di bin xizmeta dagirkeriyê de fikrê Bacon, Newton, Dekart ji xwe re weke hacet dît û li ser

xwezayê dagirkeriya xwe îlan kir. Jê şûnde teknolojî û zanist ji bo dagir kirina xwezayê bikar anîn. Ne tenê xwezaya yekemîn li ser xwezaya duyemîn(mirov) jî dagirkerî ferz kirin. Êdî xwezayê wekî ezmûngehê dibînin. Mirov, ajal û zindiyên din jî wekî amûrê ceribandine… Ev nezîkayî gihîşt wê astê ku di ezmûngehê de êdî zanyar kirdeye, xweza jî bireser e. Dema zanyar ceribandina dike, hemû maneviyat û nirxê exlaqî ji bîr dike. Di bîra wî de tenê feydeya bêhtirîn heye. Ji ber vê jî zanista ku ji bo jiyanê biwate û hêsan bike dibe dijminê jiyanê.

## E) Nêzîkatiyên Di Derbarê Ekolojî de

Xweza dayîka hemû zindiyan e. Em dikarin bejin ku bê xweza jiyan nabe. Ango hebûn û tinebûna me ye. Ji ber destpêka gerdûnê de xweza çêbû. Xweza li ser esasê hevsengiyekê hat çêkirin. Bi awayekî ku yek yeki temam bike, bê ku hevdû tune bikin. Di civaka xwezayî de berî derketina zihniyeta desthilatdarî, ekolojî bingeha jiyanê bû. Her kes bi awayekî bihurmet û rêzdarî nêzî xwezayê dibû. Xweza zindî didîtin û perçeyek ji xwe didîtin. Di heman demê de têkiliya di

navbera xweza û mirov de wekî têkiliya di navbera dayik û zarokê wê de bû. Tu cûdahî ne dixistin navbera xwe. Ji ber ku xweza, mirov û hemû zindî di nav yekbûnê de dijîn. Li ser vî esasî tevdigeriyan. Lê piştî derketina zihniyeta desthilatdar, xweza ji asta navendî daket asta tune kirine. Ji gelek aliya zehmetî dît. Çi ji aliyê teknoloji. Teknolojî bi awayekî berfireh di van salên dawî de pêşket. Ev pêş ketin jî hişt ku xweza bi awayekî mezin were şikandin. Ev jî encama lêgerîna mirovan ya desthilatdariyê ye.

Piştî jirêderketina dîrokî mirov berê xwe dan desthilatdariyê, ji heqîqetê dûr ketin, ji xwezaya dayîk re jî tu rist nehiştin. Li ser xwezayê dagirkeriya xwe ava kirin, xweza xistin bin kontrola xwe û li gorî berjewendiyên xwe tevgeriyan. Dest bi qut kirina daran kirin. Li şûna vê febrîqe û pirojeyên tune kirinê ava kirin. Ev nêzîkayî jî roj bi roj ber bi tune kirina ekolojî ve dibe. Em dikarin van nêzîkayiyan ji aliyên mirovan ve beş beş şîrove bikin.

*Ji aliyê çandina axê ve; Ji bo paqij kirina hin giya û haşeratên ku di nav axê de ne û zirar didin axê, dermanên kîmyewî yên tên şixulandin, gelek haşeratên

ku axê tevdidin û feyde li axê dikin jî dikuje. Di encama vê yekê de axê jî jahrî dikin.

*Avdana şaş ev jî dewrekî xwe yê esasî heye. Avdana zêde carna dihêle ku ax were şûştin û hemû mîneralên di nav axê de tune bibe û ax bê bereket bibe. Dîsa pîştî paleyiyê bi şewitandina pirêzan re hin zindî û mîneralên di nav axê de dimirin, bi agir ve ax jî dişewite. Piştî berhem rakirinê şûv hiştina axê jî xeteriyeke di derbarê nêzîkayiya li hember axê. Di vî derbarî de divê pirêze neyê şewitandin û erd neyê şûv hiştin. Li şûna wê pirêze were cot kirin ku ji bo ew qesel dîsa tevlî axê bibe û li ser axê çandini bi dor be. Mînak; ger salek genim, nîsk an jî ceh be divê sala din bostan, pembû, baxçe, tûtin hwd be. Ev jî dihêle ku ax bêhna xwe berde.

*Herwiha ji bo erdnîgariya Kurdistanê xera bike, ji bo têkiliya Gerillayên azadiyê û gel ji hev qut bike bendavên hatine çêkirin xwezaya Kurdîstanê tune dike, ava Kurdistanê ziwa dike, zindiyên di nav avê de tune dike. Ji ber di milê çavkaniyên avê, madeyên binerd de erdnîgariya Kurdistanê dewlemend e her tim bûye hedef. Ji bo xwezaya Kurdistanê xera bikin dagirkeran

bi zanebûn çavkaniyên avê yên Kurdistanê ziwa dikin, qirêj dikin û dest danîn ser. Di vê demê de gola Ûrmiye û gola Wanê êdî li ber ziwabûnê ye. Sedema wê jî siyaseta dewletên dagirker ya Îran û Tirkiyê ye.

*Ji aliyê lawira ve; Di nav gerdûn-xwezayê de her zindî bi taybetmendiyê xwe, bi balkeşiya xwe û bi ristê xwe, di nav yekpareyiyê de bi hevsengî dijî. Kerameta xwezayê jî di vir de ye ji xwe. Ewqas zindiyên taybetmendiyên wan ku dijberî hevin dîsa jî ji bo heman rastiyê tevdigerin. Û di nav yekîtiyê de perçeyek ji heqîqeta xulqînêne. Lawir jî yek ji wan e. Her lawir di nav çerxa ekolojîk de xwedî ristekî ye û ji bo wê armanca dawî tevdiger e. Di nav çerxa ekolojîk de çawa ristê mirova girînge di heman demê de rista mêşa hingiv, çûkek an jî dûbîşkekî jî ewqas girîng e. Dema yek ji wan bi ristê xwe tevnegere wê demê di pergalê de xerabûn çêdibe. Her lawir ji bo ristê xwe bilîze, ji bo xwe têr bike û berdewamiya xwe bidest bixe pêwîstiya wê bi cihekî ewle heye. Lê belê ji ber ku mirov di nav xwezayê de li dijî ristê xwe tevdigere ji bo zindiyên din derfetê jiyanê nahêle. Nêçîra ku bi helwesteke çavbirçî dike, talangerî, hêsta serwerî û hwd jiyana lawira dixe xeteriyê. Lawirên bi milyonan

sal li hember şertên zehmet yên xwezayê berxwedane û jiyana xwe domandine niha bi destê mirova neslê wan ber bi tunebûnê ve diçe. Lawirek ji bo zikê xwe têr bike lawirekî din dixwe. Ev tiştekî xwezayî ye û cinsê lawirê din tune nake. Ema di xwezayê de lawirek ji bo kurkê wî lawirekî din nakuje. Lê belê mirov dikuje.

*Nêçîrvaniya ji derveyê pêwistî, bê sinor û bêdem dihêle ku cinsên hin heywana bigihije ber tune bûnê an jî tune bibe. Bes ji bo nefsê xwe têr bike.

*Dîsa ji bo mesref kêm bibe awayiyên li ser daristana, li ser axa derveyê avadaniyê tên çê kirin... Daristanên ji bo mezin bibe bi deh salan dixwaze tune dike. Di çêkirina avayiya, di tune kirina daristanan de gelek lawir jî tên kuştin. Berovajiyê vê hevsengiya xwezayê ne li ser esasê tune kirinê, li ser esasê hev temam kirin û zêde kirinê ye. Ji ber vê yeke divê mirov lawiran jî biparêze û nekuje. Nêçîrvanî jî divê were sinordar kirin. Lawirên mê neyên kuştin, werin parastin. Di dema zêdebûna wan de -wek masî- divê nêçîra wan qedexe be. Divê heywanên ku cisnê wan kêm bûye divê neyê nêçîr kirin.

*Ji aliyê daristan û nebata ve; Divê neyê ji bîr kirin ku di nav zindîbûnê de her zindî bi hebûna xwe xweşik û bi wate ye. Daristan, nebat û şînkayî him ji aliyekî ve warê gelek zindiyan e, him jî jiyan dide mirovan. Daristana ku weke kezeba spî ya cîhanê tê binav kirin zindiyeke ku jiyan dide pir zindiya. Çavkaniya hewaya jiyanê ya oksîjenê ye. Ji ber wê jî nêzîkayiyên şaş yên li hember daristan û nebata heya neyê terikandin wê zerar bide xwezayê.

Axaftinêk heye dibêje kesê ku paşeroja xwe bifikire wê darekê biçîne. Daristanên ku li hember çolbûnê, li hember maşîna axê, li hember lehiyê mirov û lawira diparêze ji bo hemû zindiya jiyanî ye. Fêkî û berhemê wê jî zêdeyiya wê û ji bo zindiyên din diyariya wê ye. Çawa dayîk şîr dide zarokê xwe, ax wisa dara dide, dar jî şîr dide, fêkî dide. Ji bo darek baş mezin bibe, koka xwe qewîm berde axê 40-50 sal pêwîste. Piştî mezin bû feydeyê xwe giranbihaye û bêdem e. Lê bes tune kirina wê di destê mirovên dagirker de pir hêsan e.

Taybet di serdema pîşesazîtiyê de ji bo qezenca zêde, ji bo daring û ji bo cihê avayiya dar û daristan tên qurban kirin. Dîsa di encama şerê bêsînor û şerê taybet

de di serî de daristanên Kurdistanê û Rojhilata navîn dibe hedefa dagirkeran. Di dema serokê kontra û jîtemê Tansû Çîller de hemû xwezaya Kurdistanê hatibû hedef girtin. Li gor nazariya wan “ger tu golê ziwa bikî wê demê, wê masî derbikeve bejahiyê.” Di encama şerê li dijî gerîllayên azadiyê dimeşîne de xweza û daristana Kurdistanê tune kirin. Heya niha jî vê siyaseta xwe didomînin.

Li gor gotinê dîroknasan demên berê li Kurdistanê ewqas daristan hebû ku kesekê dimeşiya ji dar û nebatan pêşiya xwe nedidît. Dîsa ji bo Kurdistanê şibandina bihuştê jî ji ber çavkaniyên avê, daristan û xweşikbûna xwezaya wê ye. Ev bihuşta dewlemend di dîrokê de her tim bûye hedefa dagirkeran.

Axaftineke civakî heye dibêje; ger êşa dar û ber ne bihîzî, wê demê eşa mirova bibihîzî. Di vê axaftinê de jî diyar dike ku li hember daristana nezîkayiyên çewt dîsa vedigere mirov. Dîsa jiyana mirova dixe xeteriyê.

## F) Pirsgirêk û xeteriyên li ser ekolojî:

Bêgûman di roja me îro de gelek pirsgirêkên xwezayê û li ser xwezayê gelek xeterî hene. Lê pêwîste ku em nas bikin gelo ev pirsgirêk xwezayîne an bi deste mirov hatine çê kirin? Xweza bixwe di nav hevsengiyekê xwezayî de jiyan dike. Di nav vê hevsengiyê de hebûna xwe berdewam dike. Car caran pirsgirêkên xwezayî derdikevin. Lê ev pirsgirêk ji bo tanzîm kirin û hevsengiya di nav xwezayê de were rûniştin çê dibe û tu bandora xwe ya mezin li ser xwezayê tune ye. Feqat pirsgirêkên ne xwezayî yên ku bi destê mirova hatine çê kirin bandoreke xirab li ser xwezayê dike. Ev pirsgirêkên di nav xwezayê de ne xwezayîne, hin zêdetir hatine çê kirin. Derketina van pirsgirêkan bi xirabûna zihniyet ve girêdayiye. Pirsgirêkên ku bi deste mirov hatine çêkirin di destpêkê de ji zihniyeta şaş derdikeve û her wiha pirsgirêkên ekoloji derketina wê girêdayî bi xirabûna zihniyetê ye. Yanê di serdema hiyerarşîk de hêdî hêdî zihniyeta civakê ya ku ji xwezayê hez dikirin û xweza pîroz didîtin û xwe yek ji xwezayê didîtin hat guhertin. Bi pêşveçûna desthilatdariyê re êdî zilamê serdest xwe hakimê

xwezayê dît û fikrê li ser xwezayê dagirkeriya mirov derxistin. Li gor vî fikri xweza bi giştî ji bo bi cih anîna pewistiyên mirova ye. Mafê mirov heye ku li ser xwezayê her tiştî bike û biceribîne. Berî ku fikrê zilamê dagirker serdest bibe, jin mîna xwezayê dihat ditin. Pîrozahiya jin û xwezayê hebû. Jin û xweza yek bû. Xwezayê di kesayeta jinê de didîtin. Dema ku jin hate xistin û hate kole kirin û bi guhertina zihniyetê re ekolojî jî hate zeft kirin. Bi vê re pirsgirêkên ekolojiyê destpê kirin û xweza xirabû.

# BEŞA SÊYEMÎN

## A) Rengên lewitandina xwezayê

**1-Lewitandina kîmyewî:** Ev lewitandina xwezayê bi heyberên kîmyewî yên çêkirî; wekî zeyta makîna, heyberên paqijiyê, heyberên kimyewî yên li kargehan tên bikar anîn û hin heyberên kîmyewî yên di nav ba, av û axê de belav dibin zirareke mezin didin xwezayê. Her wiha dibe sedema nexweşiyên cûr bi cûr. Nexweşiya penceşêrê, nexweşiyên çerm hwd.

**2-Lewitandina heyberên şewqî:**

Ev derbasbûna heyberên şewqî li nav av, ba û ax e. Ev ji şiklê lewitandinê ya herî xirabe. Di serdema me de tê zanîn ku ev heyberên şewqî nayê dîtin û bêhn kirin. Her wiha zû bi zû derbasî zindiyan dibe. Lewitandina şewqî yên kû çawkaniya wan xwezayî ye wekî xazên ku ji rûyê erdê radibin û yên li ezmana derdikevin. Dîsa hîn çekên kîmyewî û newewî, hîn dermanên ku di qada tenduristiyê de tên bikar anîn.

**3-Lewitandina xuyanekî:**

Ewe ku dîmenên xwezayê yên bedew dema were xirab kirin û encamên wê xira bûnê dihêle ku nefsiya mirova ne baş be. Her wiha ev lewitandin di hindirê bajaran de

jî çê dibe. Weke mînak; Dema ku kolanên bajêr, sazî û mal bi awayekî bêtanzîm tê çê kirin û di heman bajêrî de gemara bajêr li derveyê poxana belav dibe ew jî lewitandineke xuyanekî ye. Dîsa malên xirabûyî, erebeyên bê tanzîm tên bi cih kirin menzereyê bajêr xira dike û di derbarê lewitandinê de zirar dide xwezaya mirov.

**4-Lewitandina bideng:**

Ew jî encamên dengên erebeyan, trên, balafir û makîneyên kargehan çê dibe. Ev awayê lewitandinê li bajarê mezin pir zêdeye. Lewitandina deng bandora xwe li ser mirova bi şiklê; kêmbûna razanê, lewazbûna gewde, xirabûna nefsiya mirov, dinav xwînê de bilindbûna asta kolêstêrolê derdikeve holê.

**5-Lewitandina tebeqeyên hewa:**

Ew lewitandina di tebeqeyên rûesman de çê dibe. Bi heyberên kîmyewî bandora neyîni li ser hemû zindiyan dike. Wekî xaza karbondîoksît, hidrokarbonat, madenên bi jehr wek sodyum, xaza metanê.

Ev lewitandin jî hin sedemê xwe hene. Ya yekemîn bi destê mirova ye. Şewitandina petrole, şewitandina

gemarê, tesîsên kehrebê yên nuklerî hwd bi destê mirova dibe sedemên lewitandinê. Dîsa teqînên volkanî yên ku kibrit û klorîn jê derdikeve, xaza radon encama hilandina rûyê erdê yê şewqî jê derdikeve.

**6-Lewitandina axê:**

Dema ku tiştên ne ji axê davêjin xwezayê, ev jî dihêle ku pergala xwezayî ya axê xira bibe.

**B) Bandora Pîşesazîtî (Endustriyalîzm) li ser xwezayê:**

Wek destpêk emê ji bo wekî têgeh şîrovekirina endustriyalîzm hewil bidin. Endustriyalîzm peyveke latînî ye, bi kurdî tê wateya pîşesazîtî. Her wiha pîşesazîtî, jirêderketina pîşesaziyê ye. Wek tê zanîn pîşesazî amûra girêdana mirov ya bi xwezayê re ye. Xwezaya civakî bê kû tekiliyeke xwe bi awayekî xurt bi xwezayê re hebe, tu carî nikare xwe bido mîne. Ev xweza, xwezaya bi milyon sal berî civaka xwezayî hebû ye. Ji bo vê yeke pîşesazî di derbara girêdayîna mirov ya bi xwezayê re amûra herî xurt e. Ev girêdayîn û têkilî li ser esasê jiyana mirov li ser ruyê erde û di

asta gerdûnî de hêsan kirin e. Pîşesazî bi tena serê xwe ne pirsgirêk ne jî xirab e. Tu pirsgirêka pîşesazî bi ekolojî re tune ye. Nexwe pirsgirêk di kur de ye?

Pirsgirêka heyî di rêbazên bikar anîna pîşesaziyê de ye. Pîşesazî weke atomeke newewî ye. Ger bikaranîna wê ji bo dagirkerî, berhemên zêde û xwînmijiyê be wê demê dibe wekî amûrê tune kirina jiyanê. Ne tene jiyana mirov, jiyana lawira, jiyana nebata bi giştî jiyana xwezayê dixe xeteriyê û dibe sedema qirkirina gerdûnê ye. Halbûkî ew atoma newewî bi awayekî rast were bikar anin, wê deme dikeve xizmeta mirovahiyê û tu zerar û ziyanên xwe li ser hawirdorê çênabe. Em dikarin mînaka kehrebê bidin. Bi rêka amûrê pîşesazî ji gelekî madeyên enerjiya xwezayî kehrebe çê dibe û digihije her dewerê.

## C) Şoreşa pîşesazît

Li ser bingeha fikir, ceribandin û keda civakê şoreşa pîşesazîtî pêkhat. Ji bo hêsan kirina jiyana mirova û pêşve birina jiyanê şoreşa pîşesazî gaveke mezin bû.

Dawiya sedsala 18. û destpêka sedsala 19. Şoreşa pîşesazî xwe damezirand. Lê belê ev gavên hatin avêtin û ev avahiyên ku di şoreşa pîşesazî de hatine afirandin û pêş xistin ketiye xizmeta desthilatdarî û sermayedariyê. Belê ev çawa pêk hatiye?

Dewletên sermayedar ji berjewendiyên xwe û ji bo berhemên zêde kargeh dan ava kirin. Ev kargeh û fabriqe li ser talan kirina xwezayê û bi şiklekî pir zêde hat saz kirin. Ji bo tiştên avêtî yê febrîqê tu pêşgirî ne hat kirin. Li ser daristana febriqe hatin ava kirin. Ji bo ava kirina kargeha daristan hatin şewitandin û lawirên di nav de hatin qetil kirin. Piranî kar bi destê robotan hat kirin. Mirov ji kedê hate dûr xistin. Her çiqas febriqe pêş ketin bandora xwe li ser civak û alavên civakê kir. Êdî civak ji destkeftiyên xwe û ji alavên xwe hate bêpar kirin. Ev bandora neyînî heta roja îro didome. Êdî civak nema dizane di vê rewşê de çi bike. Hemû derfet û qadên aboriya civakê ji sermayedariyê re hate pêş kêş kirin. Ev rewş heya roja îro jî didome.
Hêzên sermayedar civak mehkûmê pergala sermayedariyê kir. Ji bo civak nebe xwediyê xwe, ji nirxên xwe hate qut kirin. Her wiha ji bo civak hebûna xwe bidomîne û biparêze, neçar ma berê xwe bide

pergala sermayedariyê û pê re yek bibe. Êdî pergala sermayedarî pêwistiyên xwe nema bi karkeran pêk tîne, ji ber ku kargehên bi robot şûna keda mirova girtiye. Di encama vê de betalî-bêkariyeke mezin derketiye holê. Li vir ji bo mirova du vebijark (alternatif) heye. An mirov wê bibin kole û neçarê vê sîstemê an jî wê ji bêkarî û birçîbûnê bimirin.

Bi giştî febriqeyên ku di pergala sermayedarî de hatine ava kirin û berhemên wê ji bo berîka sermayedara tije bike û pergala wan xurt bike ye. Ne ji bo hêsan kirina mirova ji bo tune kirina mirov û xwezayê ye. Dewlet û kesên sermayedar nema wate didin ekolojiyê û li pey sermaya xwe ketine. Ka çawa û bi çi rengî bi kare danehevê rabin û sermaya xwe berfireh bikin û çawa di asta cîhanî de bibin xwedî bandor.

Îro bi milyaran febrîqe hatina ava kirin. Ev febrîqe zerareke pir mezin li gerdûnê dike û êdî gerdûn bi awayekî berfireh roj bi roj têk diçe. Ev bi xwe re bandoreke mezin li ser hemû zindî û xwezayê dike. Êdî xweza nema wekî bere berheman dide. Ji ber ku ev tiştên ku me anî ser ziman ne bi awayekî sîstematîk tê bikar anîn. Weke mînak hewaya qirêj ya ji kargehan

derdikeve bandora neyînî li ser xwezayê dike. Berhemên zêde yên ji febrîqeyan derdikevin, derveyê pêwistiyên civakê ye. Ji hejmara mirova zêdetir çê kirina erebeyan û hewaya qirêj ya ji erebeyan derdikeve xwezayê jî xera dike.

Bi taybet jî roja me îro sermayedarî bi şer û teknolojiya şer xwe li ser linga dihêle. Bi berfirehbûna eniya şer, di senayiya şer de jî guhertin çê kir. Ev yek jî qetil kirina milyona û qetil kirina hemû zindî û xwezayê ye. Îro giştî cîhan li hember teknolojiya şer bûye mîna gaveke biçûk ya atomê. Bi yek bombeyê bi hezaran, milyonan mirov û zindî tê tune kirin. Wek mînakê Hîroşîma, Helebçe.

Di heman demê de bandora bajarvaniyê ya ku bûye weke nexweşiya penceşêrê û li ser rûyê erdê belav bûye. Ji bo ava kirina bajêran bi milyonan daristan hatiye tune kirin û sotandin. Her wiha bendavên ku ji aliyê dewletê ve tên ava kirin, dibe sedema ziwabûna xwezayê û hişkbûna dar, şînkayî, erd û zewiyan. Di derbarê vê yekê de Rêbertî dibêje; Bendav kuştina xwezayê ye.

Hişmendiya desthilatdariyê bi her karê xirabiyê radibe,

mîna ev şerê ku îro diqewime berî zayîne 3500 sal dest pê kiriye û heya îro berdewame. Her desthilatdar dixwaze bibe hakim û tevahî cîhanê bixe bin kontrola xwe. Ji bo vê jî amûrên wan yê sereke çekên kimyewîne. Ev çekên kimyewî ne tene jiyana mirova hemû jiyanên zindî dixe xeteriyê. Mîna kunbûna tebeqeya ozonê… Germahiya zêde heye, demsal pergala xwe şaş kirine, demên wan hatiye guhertin. Rixmê ewqas xirabî û xeteriyan ji bo sermyedaran ev yek ne xem e.

Sermayedarên cîhanî, her tim dixwazin şer berdewam bike. Ji bo ku karibin di nav vê aloziyê de xwe xurt bikin û çekên xwe bifiroşin. Bi vê re jî sermaya xwe zêde bikin. Di derbara vê de gotineke pir xweş ya Hinûd El Humur ya ku dibêje; "Dema ku masiya dawî mir, çemê dawî ziwa bû, dara dawî hişk bû û ajalên dawî mir, wê deme zilamê spî wê bizane qiymeta pereyan tune ye.

## D) Têkiliya aborî û ekolojî:

Berî ku em têkiliya di navbera ekolojî û aborî de bînin ziman, pêwîste em wan şîrove bikin. Di rûpelên destpêkê de têgîna ekolojî wekî zanista navmalî pênase kiribû. Di çarçoveya vê pênaseyê de ji bo ku em nas bikin, divê em aboriyê jî pênase bikin.

Aborî di zimanê latînî de weke “economîa, ekonomîa” derbas dibe. Têgeha ekomomî ji Ekonomos hatiye afirandin. Jêdereke ekonomos e, ji Eko-nomos ew jî tê wateya zagonên malê, ji vê peyvê ji aboriya nav malê weke Ekonomî jêder bûye.

Bi awayekî giştî mirov dikare aboriyê weke xebata destxistina pêdiviyên madî yên civakê û sazûmaniya wê ravebike. Pergala dewletî, bi taybet jî dewletên sermayedar xwe weke bingeha aboriyê û xwe xwedîkirina civakê diyar dikin. Wisa diyar dikin ku ger sermayedarî nebe ji bo civakê wê derfetên jiyanê tune be. Lê di esasê xwe de li gor feraset û zanista civakî tiştekî wisa nîne û sermayedarî dijberî aboriya civakê ye. Û aborî ne li ser esasê kom kirina berhemê zêde ye.

Aborî xazîneya jiyanê ye, di pêvajoya dîrokê de aborî tene bi destxistina pêdiviyên rojane u udi destê cîvakê de li gorî pêwîstiyan bû, her wiha bi xwezayê re li ser bingehê hevsengiyeke dostane bû. Her mirovek ji bo mayînde kirina jiyana xwe, xwe fêrî pergala aboriyê dike. Di vir de roj bi roj sîstema aborî pêş dixist, her ku pêş dixist di derbarê xwezayê de naskirineke xwe çêdibû ku çawa aboriyê bidest bixe. Her ku aborî di nav cîvakê de pêşket, dewlemendiyek jî çêbû. Ev dewlemendbûn diket xizmeta civakê. Bi awayekî hevbeş tanzîm kiri li gor pêwistiyên civakê dihat bikar anîn. Bê hesûdî û bê çavnebarî bû. Hemû beşên aboriyê hebûn. Wek çandinî; her sal tov dihat parastin û li gor demsalan dihat çandin. Di heman demê de lawir kedî dikirin. Ji ber ku jê sûd bigrin. Çêlek, xezal, pez, hesp hwd. dihatin kedî kirin û ji bo xwe xwedî kirin û di karê malê de ji heywana feyde didîtin. Bi vî rengî dibûn berhemên aboriya civakê û ji civakê re dibû çandeke pir pîroz ku bi hezaran sal jiyana xwe li ser domandine. Heta roja îro jî li hin netewa remz û pîrozbahiya hin lawiran, bingeha xwe ji vê çandê û ji têkiliya di nav mirov û xwezayê digire. Mînak çêlek, pêz, bizin, xezal, pisîk û hwd. Piştî naskirina me ji ekolojî û aborî re hate

diyar kirin ku herdu pergal bê hev nabin. Bêgûman pergala aboriya civakê xwe li ser ekolojiyê dide ava kirin. Jîndeyên herdû pergala bi hev re jiyanekê ji bo tevahî cîhanê didomînin.

Ekolojî hawirdora zindiya ye, ya ku li ser wan bandor dike û wekî dayîkekê ax, av, ba, avhewa, maden, lawir û her weke zindiyên din, di hindirê xwe de dihewîne.

Di heman demê de ev hêmanên madî çavkaniyên aboriyê ne.

Divê neyê ji bîr kirin ku pergala xwezayî ne tenê ji bo têr kirina mirova dixebite. Aborî ne tenê ji bo mirova ye. Di heman demê de ji bo lawir, dar, nebat û ji bo hemû mêş û morî ya ye. Di nav xwezayê de ji bo hemû zindiya li gor taybetmendiyên wan û ya derdora wan, derfetên xwe têr kirinê heye. Ger mirov ji bo hin zêde berhem bigrin, dewlemendtir bibin xwezayê rût û ziwa nekin, wê ev pergal bi şiklekî pir baş bimeşe. Lê çavbirçî bûna kesên ji feraseta dagirkerî û sermayedarî tên, bi çavbirçîbûna xwe ne tenê ji bo lawir û nebata ji bo mirova jî çawkaniyên aboriyê, xwe têr kirinê nahêlin. Aboriya li ser esasê xwe xwedî kirinê derketiye holê roja îro ji bo zindiya bûye amûrê tune kirinê. Sedema vê yekê ji bo berjewendiyên şexsî sitle

û dagirkeriya li ser xwezayê ye. Ev feraseta berjewendîperest ji bo pere bidest bixe dikare her tiştî bike  qurban.
Ji bo aboriyê pêş xistina teknolojî û pîşesazî heta astekê pêwîst e. Lê divê li gor pîvanê ekolojiyê be. Di heman demê de di xizmeta parastina ekolojiyê de be, ne ya sermayedarî û dagirkeriyê. Nexwe hemû xweza jî têra sermayedariyê û pîşesazîtiyê nake.

# BEŞA ÇAREMÎN

## A) ENCAM:

Wek hemû pêkhateyên ku ji aliyê desthilatdariyê ve hatine bindest kirin, xweza jî li benda azadiya xwe ye û ji bo vê jî di nav lêgerînê de ye. Çawa ku dîrok di rûpelên xwe de tenê qala dagirkeran kiriye (dîroka heyî ji aliyê dagirkeran ve hatiye nivisandin), di dîrokê de kedkar, eşîr, qebîle, klan û netewên demokratîk cih nagirin, çawa dîroka jinê ne hatiye nivisandin... Bi heman şiklî dîroka xwezayê jî ne hatiye nivisandin. Dîroka dagirkirina xwezayê niviskî ye bes dîroka xwezayê bixwe tune ye. Xweza her çiqas bi hin nîşana qêrîna xwe tîne ser ziman, weke xerabûna xwezayê, lê dîsa jî ev qêrîn nayê bihîstin. Dîsa tehekkum û xera kirina xwezayê didome. Ji milekî ve lewitandina ax, av, ba, hewa, daristana ji milekî ve kuştina ewqas lawiran her diçe xwezayê tune dike. Li ser van jî hejmara zêde ya mirova ku di cîhanê de bicih nabe pirsgirêkên ekolojîk her diçe kûrtir dike. Ger kesên desthilatdar û sermayedarî destên xwe ji ser xwezayê bikşînin, ew hêza xwezayê heye ku weke hemû afirîna xwe nû bike.

Her çiqas ew sedemên ku me li jor qala wan kir xwezayê xera dikin jî çareseriya ekolojiyê ewqas ne

hêsan e. Ne bi derdorparêstî, ne bi lawirparêzî ne jî weke tevgerên kesk, tevgera ekolojiya kûr çareserî peyda nabe. Ji ber pirsgirêkên ekolojîk, xerabûna xwezayê kûre divê çareserî jî ji kûr de were destgirtin. Nexwe wê çareserî çawa were peyda kirin?

## B) Terikandina tekiliyên tehakkûmê:

Divê weke destpêk mirov xwe ji sedema bingeha qeyrana ekolojîk tehakûmê xwe rizgar bike. Ji ber ku bingeha pirsgirêkên ekolojiyê têkiliyên tehakûmê ye, wê demê çareserî jî divê di wir de were dest girtin. Tehakûma mirova ya li ser xwezayê, tehakûma mirov ya li ser xwezayê, tehakûma zilam ya li ser jine hwd divê were terikandin. Li şûna vê di her qada jiyanê de tevlîbûneke wekhev û jiyaneke hevpar pêk were. Ji bo vê jî zihniyeta bi hezar salan nûveyên xwe li ser civakê ferz dike, zihniyeta zilamê serdest; ya li ser esasê tehakûm, hiyerarşî ava kiriye lazime biruxe. Ji bo civak bikare vê yekê pêk bîne guhertina zihniyet, perwerde û saziyên zihniyeta nû pêwîst e. Ger di kesayet de di her qada jiyanê de tekoşîna vê yekê were dayîn, wê demê em dikarin bêjin têkiliyên li ser esasê tehakûmê wê

hilweşe. Mirov wê di danustandinê xwe de, di nêzîkayiyên xwe de azadiyê esas bigirin. Ji bo vê gelek erk dikevin ser pişta mirova.

## C) Hemwelatiya azad û hêsten welatparêzî:

Birdoziya sermayedariyê lîberalî, ji bo civakê bixe destê xwe heta dawî ferdperestî, azadiya sexte ya şexsî sor dike. Ev zihniyeta azadiya çewt û ezezîtî jî bi tehakûmê biencam dibe û berê xwe dide mirovên din û xwezayê. Ji bandoraa ev azadiya sexte were derbas kirin divê hişmendiya hemwelatiyê azad were xurt kirin. Ger her ferd bi berpirsiyariya hemwelatî, bi hêstên welatparêzî tevbigere û wisa nêzî xwezayê bibe, wê demê di nav jiyanê de rol û berpirsiyartiyên her kesekî wê diyar bibe. Ev jî bi maneviyat û hez kirinê wê pêk were. Kesekê ku ji welatê xwe hez dike, ji erdnîgarî û xwezaya welatê xwe jî hez dike û diparêzê. Ji ber vê jî hewceye ku ev hêst û berpisiyarî bi şiklekî têrker di nav civakê de were çandin. Ger her ferd bi erk û berpirsiyariyên xwe rabe, li hember civakê, li hember exlaqê azadiyê, li hember xwezayî bi şiklekî hişyar

tevbigere, wê demê ne mimkine pirsgirêkên tehakûmê û ekolojiyê derkevin.

Ev hemû hêman weke nirxekê di cevhera civakê de heye. Ji ber civak di eslê xwe de exlaqî û polîtik e. Civak hebûneke xwezayî ye. Di merheleyên dîrokî de bi şikleki xwezayî, bi xwezayê re di nav têkiliyeke xurt de pêş ketiye. Pêwîste ev têkiliya di navbera civakê de baş were fêm kirin û pêk anîn. Civak bixwe hebûneke ekolojîk e. Ekolojî jî civakî ye.
Mijareke din ya herî girîng rola senayî û bandora pîşesazîtî ye. Di nav herikîna mijarê de em li ser têkilîyê pîşesazîtî û ekolojiyê rawestiyan. Senayî û teknolojî berhemê civakê ye. Yê şoreşa senayî jî pêk aniye, yê teknolojî jî pêş xistiye civak bixwe ye. Her çiqas ji armanca xwe dûr ketibe, jirêderketiye jî di esas de ji jiyana civakê xweş û hêsan bike ji bo hevsengiya xwezayê biparêze hatîne pêş xistin. Aliyên zerar dide bandora pergala desthilatdariyê û pîşesazîtiyê ye. Divê senayî û teknolojî weke armanca xwe ya bingehîn ji bo jiyanê xweşik, hêsan û bi ewle bike tevbigere. Ji bo zerarên li ser xwezayê ji holê rabe tedbîrên pêwîst were girtin. Senayiya li hember ekolojiyê baldar, hişyar were pêş xistin. Endustriya ekolojîk encax dikare vê

xerabûnê ji holê rake, kêm bike û firseta xwe nû kirinê, bi alîkarî û projeyan bide xwezayê.

## D) Hejmara bêsînor ya bajêra:

Wek çawa xerabûn û jirêderketina zihniyetê bi xwe re bajarbûnê derxist holê, roja me îro jî bajarvanî pirsgirêk û li ser xwezayê xeteriyek e. Her diçe hejmara bajêra zêde dibe, her diçe şêniyên bajêr qelabalix dibin. Bi vê re êdî bajêr hejmareke zêde ya nifûs nikare rake. Li bajêr ji milekî ve hejmar zêde dibe lê belê li gor vê zêdebûnê avahiya bingehî ya bajêr nayê saz kirin. Ev jî bi xwe re pirsgirêkên ekolojîk û civakî derdixe holê.

Çareseriya pirsgirêkên bajêr encax bi guhertina terzê jiyanê mimkin e. Ji bo gund û bajêr di nav hevsengiyekê de bimeşin divê destpêkê tehakûm, serdestiya li ser gunda ji holê rabê. Bajêr jî qasî gunda di nav hilberînê û kedê de cih bigre. Dagirkirina keda gunda ji holê rabe wê demê wê gund û bajêr bi şiklekî hevpar bimeşin.

Herwiha ji çareseriya pirsgirêka hejmar divê li şûna bajêr, jiyana gunda û saz kirina gunda derkeve pêş. Jiyana civakê çawa di civaka xwezayî de li ser esasê

gunda dimeşiya roja îro jî dîsa divê gund werin teşwiq kirin. Rêber Ebdullah Ocelan ji vê mijarê weke projeyekê vegerîna gunda pêşniyar kir. Ev proje di heman demê de ji bo ekolojiyê ji weke mijareke çareseriyê derbasdar e.

Dîsa bajarên qelebalix divê were biçuk kirin û bajêrên ekolojîk werin saz kirin. Ji dûmana egsozên erebeyan bigire, ji lûleyên febrika, ji şixulandina madeyên enerjiyê heta avahiya bingehî ya bajêr, ji hediqe, baxçe û çandina dara bigire heta hawirdorparêzî divê bajêr û şêniyên bajêr li hember xwezayê hişyar tevbigere. Herwiha ger çanda xeritandinê were terikandin û hin zêdetir ked û hilberîn derkeve pêş wê demê xerbûn jî wê ji holê rabe. Ji ber ku kesê afirîner, kedkar tiştê ku diafirîne xera nake, qiymeta wê dizane. Bi vê re jî civaka hilberîner çareseriya pirsgirêka ye.

## E) Cîvaka demokratîk û ekolojîk:

Tehakûm-hiyerarşî-desthilatdarî çawa ku bingeha hemû pirsgirêkên civakî, xwezayî û azadiyê ye, wê demê divê lêgerîna ev nirxên ku ji dest çûne jî di

çareserkirin û binxistina vê pergalê de were gerîn. Rêvebirina pergala dewletê bi terzê xwe ya navendî, hiyerarşîk dibe bingeha hemû pirsgirêkên civakî. Ji ber ku terzê xwe navendî ye gewdê wê giran e, nagihije pirsgirêkan û li şûna çareseriyê pirsgirêkan hin bêtir kûr dike. Ji çareseriya pirsgirêkên civak- ekolojiyê jî ti projeyên çareseriyê tune ye. Dewlet di eslê xwe de li ser dagirkirina civak û xwezayê hatiye ava kirin. Dewlet desthilatdariya li ser civakê ye. Li şûna vê mekanîzmayê divê siyasete demokratîk, rêvebirineke demokratîk û civaka demokratîk û ekolojîk were ava kirin. Li ser nirxê civaka exlaqî û polîtîk divê hemû pergala civakî ji nû vê xwe ava bike.

Ji bo çareseriya pirsgirêkên civakî divê erka rêvebirinê di destê gel de be ku karibe pirsgirêkên xwe çareser bike. Bi tevlîbûneke demokratîk gel tevlî pergala rêvebirinê bibe. Li şûna navendîbûnê divê rêveberiyên xwecihî were esas girtin. Di mijara çareser kirina pirsgirêkan de meclis û şaredarî xwedî insiyatif be û sereke be. Ji bo qeyrana siyasî-civakî-ekolojiyê were derbas kirin, ji bo giştî cîhanê jî pergala rêveberiyên xweser û federasyonê herî guncav e. Encax di nav vê

pergalê de tekiliyên tehakûm û dagirkeriyê lewaz bibe û tune bibe.

Bi giştî ji pêkanîna wan zihniyeta demokratîk-ekolojîk û azadiya civakî pêwist e. Ev jî bi zihniyeteke nû, bi perwerde û bi tekoşînê wê bi serkeve.

# ÇAVKANÎ

-Berheva paraznamameyên Rêberê Gelê Kurd Ebdullah Ocelan

-Komunar- malper û kovara birdozî ya akademiya zanistên civakî

-Lêkolînên akademiya zanistên civakî

-Rachel Carson- buhara bêdeng-1962

-Mûray Bûkîn- Ber bi ekolojiyeke civakî ve, ekolojî û komînalîzm



WEŞANÊN KOMÎTEYA LÊKOLÎN Û ZANISTÊN CIVAKÎ